

NÇE

NÇE

NÇE

Bajarokê Şiyê Perda reş girêda

Roja yekê ji cejna rojiyê -01-10-



ŞixoEloş



Ebdil-ezîz

2008- li bajarokê Şiyê, qederê perda reş bi ser de berda. Di encama bûyerek tirafêkê de, sê ciwan

1-Şêxo Eloş kurê Mihemed ji gundî Şiyê 2- Ebdil-ezîz

Yosif kurî mihemed ji gundê Şiyê 3- Ehmed Eloş kurî Ebdîn ji gundî Erendê çûn ser dijovaniya Xweda.

Di wê rojê de, kat Ebdil-ezîz bi beşdariya xwedî û berketiyn wî li gorisatana bajarokê Şiyê tê binaxkirin. Roja din kat 9.30 heval Şêxo Eloş bi beşdariya xwedî, gundî, havalên partia Yekîti ya Demokrat a Kurd –YKÎTÎ- , li guristana gund tê veşartin.. Heval bavê Rêber gotineke gurt li ser xebata havalê xwe got û di dûre, bavê bahoz jî hin şîretan li bav û ciwanan dike. Piştî e, beşdar berê xwe didin goristana gundê ERENDÊ û Ehmed jî binax dikin

Bila serê xwedî û gundiyên Şiyê û Erendê sax be û ciyê wan buhişt be.

Heval Weqfî jî barkir

Di 20 ê Ç.Pêşîn de, li nexwaşxana Ibin El-rişd li Heleb, piştî demek dirêj

ji nexwaşiyê, Hevalê hîja mamoste Weqfî, çavên xwe damrandin. Bi beşdariya xwedî, heval û dostên wî, kewranekî mezin bi termê wî re bi rêket û berê xwe dane gundê Kêla. Li gundê Kêla, bilî kewranê Heleb, gundiyên Kêla û derdora wê jî li ser gurnê beşdar bûn. Piştî Telqina mele, bi navê Partiya Yekîti ya Demokrat a Kurd li Sûriyê –Yekîti- endamê komîta siyasî evokat Reşîd Şe,ban , ev gotina jêrîn xwend:

Birayên hêja

Mîvanên giranbuha....

Ev roj, rojeke xemgîne, roja barkirina hevalê me, mamoste Weqfî ya ser dilovaniya xwe ye. Heval Weqfî, di destpêka jiyana xwe de, xemxwer û berketiyê miletê xwe bû. Di



zanîngeha Heleb de, ji bo doza gelê xwe, çalakvan, jîr û jêhatî bû. Û di dibistanan de, tu cudahî , di navbera şagirtên Kurd û Ereb de nedikir.

Beşdarên hêja Mirina mamoste Weqfî, ne tenê zirara malbat û gundê Kêla bû. Lê belê, zirara miletê Kurd, tegera wî û demokrasiyê bû.

Bi navê Partiya Yekîti ya Demokrat a Kurd li Sûriyê –Yekîti- bila serê malbat, xanim, herdu zarowan, Gundiyên Kêla û derdora wan , heval û dostên wî saxbin. Û sipas ji guhdariya we re.